

## Hevrikî di helbesta pêşimerge de

Azad Dartas



Seriheldana bihara sala 1991 rûdaneka mezinbû, şûnwarên xwe ne bi tinê li ser nexşeya sîyasî û civakî, belkû li ser jîyana hizirî û rewşenbîrî jî hêlayne, lewma jî di xwandina torê kurdî de yê ku piştî serihildanê hatî ye nivîsîn dê bînin ku ev karên toreyî bi rengekê mezin bi wê rûdanê daxibar bûne. Ev jî netîstek fîz û entîkeye, çunkû her karekê toreyî pêdivî ye bibe berihemekê ketiwarekê xweya û qonaxeka dîrokî ya destnîşankirî. Em dibêjin serihildan di dîroka nû ya gelê me de rûdaneka mezin û pir bihabû, çunkû bû cara êkê bû, ev millete di dîroka xweya nû de şîya xaka xwe rizgar bike û dagîrikeran ji erdê xwe biramalîne, piranîya helbestvanan li pêş vê rûdanê dilşad û mendehoş rawestan û rastî ya hindê bo wan xûyabû ku amiraz û şeweyên wan yên helbestên kevin nikarîn derbibirin û wergirtina van guhorînan bikin. Dema em her karekê toreyî bixûnin gereke em li jêr rewşa guhorîn û bi serêkdaçûna wêneyên ku nûnerîya rewte ketiwarî dikin bixûnin, li vê derê jî pêdivî ye em rolê dahênerî jibîrinekin çunkû azadîya dahênerî û ya nivîserî karê xwe dike.

Her nivîserekî du cîhan yan jî du civak hene, cîhana wî yakesatî, ya dwyê jî ew cîhane ya ku helbestvan ((nivîser)) têde dijît, ((civak)) bi tev hevirikî û dijatîya xwe ve, ev karên he di encam de, digel tiştên dî bêguman, ne ji Aliyê şeweyî ve dê taybet bin û ji Aliyê naverokî ve dê hevpişk bin. Derbarey vê çendê jî nivîser cakob kurik ((Jacob korg)) (2) dibêje: ((şewe ew e yê ku karî taybetî dike, naverok jî ew e ku digel tiştên dî hevpişk dike)).

((pêşimerge)) navenîşanên helbesteka helbestvan ((hizirivan)) e têde helbestvan xwe ji şeweyên helbestê yên nîyas derbaz dike û zimanekê helbestê yê nû digere. Di vê vekolînê de jî ez dê hewil bidim bi tinê avahyê helbestê bigirim bi rêka xwandina stûnên wê yên ciwanyê û avakirinê yê ravekirina çelengên wê yên sosyolojî.

Mîna me li pêşyê gotî serihildan rûdaneka mezin bû \_ vê rûdanê jî wêneyên nû di hişê helbestvanî de peydakirin. Evca feribû helbestvan li dû qalibekê dî bigere ji bona têrikirina van hemû bîru boçûn û hizran, li ser vê çendê ((edînos)) dibêje: (ger te vîya nûkirinê bikî, te ne ji ber nûkirinê bi tenê ye, te ji ber hindê ye ku te hindek gotin hene nahêne gotin bê nûkirin) (3).

Di vê helbestê de, ez nûkirinê dibînim hevirikîyek e dijî genîbûna zimanî yan ku gerîyan li dû ramaneka kûrtir yan jî dana hindek ramanên dî ku di peyvê de karekê mezin tir bû ku peyv bikaribe pêtirîya hêmayan bide. Ez dibêjim nûkirin ((nenûxwazî))-vê çendê jî dê di xaleka dî de vekolînê li ser bikim -... Dema min ev helbeste bo cara dwyê xwandî min digel xwe bi dengê bilind xwand ((çunkû di cara êkê de min zanî ku helbestvanî helbesta xwe li ser sîstemê birigeyan nenivîsî ye)) daku bizanim helbestvanî di avakirina mozîka helbesta xwe de çi bikar anî ye, bo min xûyabû ku helbestvanî lêdan û mozîka navxweyî û mozîka risteya klasîkî bikaranî ye. Bo nimûne di vê helbestê de û li dûmahîya hijmareka risteyên helbestê de ev peyve bikarihatîne ((gel, meşxel)) yan jî ((nebûn, serxwebûn, pêşveçûn)) ev çend e jî helbestê ji nûxazyê dût dêxe çunkû bi şêweyekê raportî rastewxwe hatî ye nivîsîn.

Lêdan jî weku rexnegir (fazil tamir) (4) dibêje, ji peyveka Yonanî (girîkî) hatî ye, bi ramana jordeçonê, lêdan jî bi rengê giştî du hebûne di navbera du awayan de mîna (deng û bêdengî, tarî û ronahî, kurtî û dirêjî) eve jî di navbera tev huneran de saxleteka hevpişke. Lêdan jî yek e ji stûnên gotara helbestê berî niho jî (pilato) î giring ya lêdanê wek stûneka bineretî, ji stûnên helbestê di komara xwe de dîyar kirî ye.. Çaxê gotî helbest li ser (3) sê stûnan dihê avakirin ew jî evene:

Peyv, jêkînan, lêdan.

Helbesta (pêşimerge) bi du livînan dihê xûyakirin yek ber bi peqîna wêneyê helbestê ve diçe û dike (şivaya) saçmeyên pirt û belav lê hev du digirin mîna:

(pê bend.. Pêşimerge.. Baran)

(soz.. Bawerî.. Berxwedan)

Li vê derê em dibînin kanê çi peywendî di navbera van peyvan de hene.. Bi hizra me du peywendî hene, ew jî evene: Peywendîyeka wekhevî anku peyvek ya dî peyda dike yan jî yek dibe (eger) û ya dî jî dibe (encam) bo nimûne (pê bend) hevdîja peyva (pêşimerge) ye, (pêşimerge) jî wekheva (baran) e, yan jî soz, (bawerî) dibine berxwedan, careka dî (pêşimerge) dibe nişanê berxwedanê ew jî

encamê çewisandina (pê bendî) yê ye. Evca tev hevdu digirin. Helbestvanî ev peyvên he jî ne bi nezanîn û bêdesitî danayine.

Evca gereke xwandevan ne nêre van peyvên ku bi tenê hatîne ji bona ciwankaryê, belkû berê xwe bide ankû ramanên pişt peyvên û peywendiyên di navbera wan de peyda dike.

Li vê derê peyv li dû arazên peywendiyên di navbera xwe de digerin, peyv jî nîşan û ramanan bi rêka cihê xwe di helbestê de werdigire mîna her parçeyek ji parçeyên şetrencê, bihayê xwe werdigire ji cihê xwe li ser çar guşeya yaryê.

Li vê derê peqîna peyvên di risteya helbesitî de rû dide û ji ramana xwe ya ferhengê derdike ve û hejmarek dî ji ramanan dide. Eve jî daxwazîyek e ji layê helbestvanî ve ji bo pişkdariya xwandevanî di vavartina helbestê û rêkxistina wê de, her wekû rixneger û helbestvan Qoçanî dibêje (li van dûmahîyan renekê dî yê wênegirtinê hatî ye gorê ew jî paldana peyvekê bi tinê wek wêne û duwêkxistina gelek wêneyan ku rê bide xwandevanî ku wan pirta di hizra xwe de lêk bide (5). Li vê derê jî wêneyê helbestê di hişê xwandevanî de peyda dibe û bêguman dê tiştêkê nû afirîne.

Belkû jî nek dibêjin ev helbeste dikeve der ve yî bazna nûxwazyê çunkû taytlê helbestê (p. Mi) vê çendê hildiweşîne û mandel dike û rêkê li bersîngê xwandevanî dibire û dadine beranber tiştêkê girtî her wekû rixnegirê nyozlendî (sitîd) dibêje: (êk ji saxletên helbesta nûxaz ew e vekirî ye û gelek raman jî diçin) (6).

Em dê şên bibêjin helbesta (p. Mi) li rex û rûyên nûxazyê dizivire.

Lê dîsan me divêt bibêjin ku ev rengê helbestê nûye wekû Qoçanî dibêje lê ne di torê cîhanê de, belkû bi tinê di torê kurdî de.

Nivîsera firensî (sozan birinar) sebarec vî babetî dipeyve herwesa helbestvan (walit ûman) mifa ji sîstemê lêdanê di nicîlê û tewratê de wergirtî ye, dîsan helbestvan (hizirivan) dibêje (min mifa ji nivîştoka avêsta ya zerdeşt wergirtî ye).

Helbestvan (ezira pawnd) piştî xwandina helbesta çînî û japonî gehiştê hindê ku çêdibe helbesta çînî berihemê zincîreka wêneyên helbesitî be bê ku peywendî di navbera wan de hebe.

Di rêza sêyê de ji wê helbesta çînî ya ku (pawnd) î wergîray jêr taytlê (behîya zêrevana sinorî) dê van peyvên bînin (dar.. Werîyan.. Payîz.. Gîya.. Zer)

Ramana van peyvên jî her wek (vînoloşa) dibêje:

Li werzê payîzê gîya zer dibe û belgên dara diwer in.

Wesa bo (pawnd) î xûyabû ku helbesta çînî herdem peyvên serekî (wêneyan) pêşkêş dike.

Bê ku tiştên din yên zimanî mîna amirazên peywendîyan û daçekên (pirupozêşin) û ta radeyekî jî fermana bikar bînin.

Eve jî wek (pawnd) dibêje: Lezî.. Kurtî.. Aborî.. Kunkirîti.. Wihandana hizirê li ser helbestê belav dike (7).

Evca li dû têgehiştina me ji be nûxazîya erupî ev helbeste (pêşimerge) dikeve der ve yî xaneya nûxazyê.

Lê wesa dîyar e hevalê helbestvan (hizirivan) li dû nûxazîyeka xwemalî digere wek pêdivîyeka babetî bi wergirtina mafî ji hindêk saxletên nûxazîya rojavayî bê pişt\guhkirina kelitorê me yê kevin (ku ta niho gencîneyeka ser muhire) da ku bi bibe jêderekê serekî û tevavker ji bo nûxazîya me.

Li van dûmahîyan jî (koma hivçerx) ya helbestê li duhok û akirê jî nemaze li duhok gehîştine vê rastîya me gotî.

Ev du xalên jêrî jî vê çendê diselmînin.

Sala (1991) desteka hevçerx kovarek bi navê (nûxazî) derêxist, lê evro em dibînin ku nivîsînên xwe bi navê (koma hevçerx) belav dikin û li jêr taytlê (nûkirin her û her).

Helbestvanên vê kumê ku (hizirivan) êk ji wane evro pitir ji kilîlek û derfetekê dide xwandevanê helbestên xwe ji bona pişkdarîya wan bike.

Herwesa van helbestvanan berê xwe daye dastanên resen yên kurdî ji bona wergirtina mifayekê mezin, em bi vê çendê digehine encamekê.. Ew jî eve ye:

Helbestvanên (koma hevçerx) ta niho bawerî bi rolê helbestê ya guhorînkêr heye.

Li dûmahyê em dibêjin: Rêka nûkirinê rêkek sexte mîna tev rêkên pêşkevîne.

Jêder û perawêz:

(1): Binêre kovara (pîrs) ya melbendê rewşenbîrî li akirê hejmar (3) helbesta pêşimerge/hzirivan.

(2): Cakob kurik-eluxih fî eledeb elhedîs, elhedase we eltecirîd 1162 .

(3): Mucelet elşir hejmar (14) 182 .

(4): Kovara (nûxazî) hejmare (2) li (25).

(5): Mucelet elseqafe elecnebî ye hejmar (43).

(6): Dest xeteka wergêray ji zimanê niglîzî ji layê helbestvan (şemal akireyî) ve.

(7): Kovara (metîn) hejmar (36) binêre helbestên helbestvanên hevçerx (selman Kovilî) û (emîr findî).